

## Gejna Rojnemevaniya Kurdî pîroz be

Reşoyê Pîrê

Rojnamegerî nêrîn û ramanên mirov û gelan diyar dike, Rola wê ne tenê ji bo parastina dîrok, çand, ziman û her tiştê bi gel ve girêdayî girîng e, lê belê ew bûyer û rûdawên di pêvajoya dîroka mirov û gelan de bûne jî diparêze. Ew ji bo parastin û dewlemendkirina zimên xwedî roleke berz û berçav e.

Gelê Kurd, di Rojhilata Navîn de, ji bo maf û azadiya xwe bi dehan raperîn rakirine. Lê mixabin dewleteke serbixwe ava nekiriye û zimanê wî nebûye zimanê dewletê. Lewre jî, rewşa rojnamegeriya Kurdî, ji yê hemî miletan diwartite.

Gava mirov çêra rojnamegeriya Kurdî dike, rasterast malbata mîrê mîran – Bedixaniyan- û bi taybetî Miqdad Medhet Bedirxan tê ber çavan. Ji ber ku, di dîroka Kurdan de, xwedî banga netewî ya siyemîne – piştî Ehmedê Xanî û Hacî Qadirê Koyî .

Piştî dewleta Osmanî, malbata Mîrê Botan Surgindikin, li Stembolê bi cîwar dibe û ji wan re dibêje " *Ez ditirsim ku hûn di nav Tirkan de, zimanê xwe ji bîr bikin û ger we zimanê xwe ji bîr kir , Hûnê welatê Botan û Kurdistanê jî ji bîr bikin. Tiştê ku min ji we divê, hûn di malên xwe de, bi*

*zarok û Zêçên xwe re, bi zimanê bav û kalav biaxifîn, yê we neke, ne kurê mine".*

Di rewşa neçariyê de, şahsiwarê peyvê, Mîrê gewre, M. Bedirxan li Misrîrêdest davê pênûsa xwe û kar û xebata rojnemavanyê dike û di 22ê Nîsana 1898 an de, yekem rojname, di bin navê "*Kurdistan*" de diweşîne. Li gorî berpirsiyarê rojnamê ku, her 15 rojan hejmarek wê bête weşandin.

Li ber zordariya dewleta Osmanî cihê çapkirina wê pir caran hatiye guhartin. Lewrejî, ew rojname bi navê rojnameya gerok hatiye nasîn.

Ji 22ê Nîsana 1898 an ve, ta 1902 an, 31 hejmar tenê hatine weşandin. H. 1-5 Qahêre. H.6-19, Cinêv. 20-23 Qahêre ,24 Lubnan, 25-29, Folkstan û30-31 li Cinêv.

Hezar rehme li gora M. Bedirxan be û cejina hemî rojnemevanan pîroz be.



*Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê  
me yê Kurd re , yên di girtîgehên Sûriyê de*